

Kurdistan In the Shadow of History¹

Necat KESKIN²

Received: Apr21, 2017 **Reviewed:** May12, 2018

Accepted: June02, 2018

Recommended citation:

Keskin,N. (2018). Kurdistan In the Shadow of History. *International Journal of Kurdish Studies*, 4 (2), 626–632. doi: [10.21600/ijoks.454583](https://doi.org/10.21600/ijoks.454583)

Bi piranî nirxandin û danasîna pirtûkên nû tê kirin lê di vê nirxandinê de em dê behsa pirtûkeke kevin bikin lewra ev pirtûk herçiqasî cara pêşî di 1997an de hatibe çapkirin jî îro hîna haya gelek kurdan jê tune ye û ji ber ku li derve hatiye çapkirin jî kurdên li Tirkîyeyê nikarin hêsanî bi dest bixin an jî bidestxistina wê hinekî zehmet e. Tenê di destê hinek kesan de heye û loma divê derbarê pirtûkê hinek agahî bi lêkolînerên sehayê û xwîneran re bîn parvekirin. Ev xebata ku em behsa wê dikin pirtûka Susan Meiselas e ku bi navê *Kurdistan In the Shadow of History (Kurdistan di bin Siya Dîrokê de)* hatiye çapkirin. Çapa duyem ya pirtûkê di 2008an de hatiye kirin û ez bawerim derbarê dîroka nêzîk a kurdan yek ji xebatên girîng e û divê di pirtûkxaneyê kesên ku li ser kurdolojîyê dixebitin de cih bigire. Ji ber vê yekê jî li gorî min pêdiviyek bi nirxandin û danasîna pirtûkê heye. Ji aliyekî din ve jî pêdivî bi nirxandin û danasîneke weha heye lewra ev xebata wênekêşiyê bi wêneyên ku tê de cih digirin hafizeya sedsalî ya kurdan pêşberî me dike. Bi gotineke din wêne ligel nivîsên tê de dîroka kurdan a sedsalî û serboriyên wan, di serê me de zindî dikin.

¹Author: Susan Meiselas, Chicago & London, University of Chicago Press, XVII+402 + 549 (werger), 2008 (Îspanya), çapa 2em.

²Asst. Prof., Dr., Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages in Turkey, Kurdish Language and Culture Department, E-mail: necatkeskin@gmail.com

Wêne amûreke bîranîn û bibîranînê ye ji bo takekesan û di heman demê de bo civakan jî di avakirina hafîzeyaya civakî de xwedî fonksiyoneke girîng e. Loma îcada kameraya wênekêşiyê ku di nîveka sedsala 19mîn de pêk hatiye di jiyana civakî ya mirovayetiye de wek kêlikeke din e. Bi vê îcadê, êdî kêlikeke jiyane di wê kêlika ku çêbûye de dikare bê “cemidandin” ku piştî wê kêlikê bi deh salan/sed salan jî mirov careke din dikare lê binêre û binirxîne. Ji bo rûdanên civakî jî wêne heman fonksiyonê tine cih. Loma îro wêne dikarin wek belgeyên dîrokî jî bîn dîtin ku mirov dikare bi saya wêneyan-bêguman ligel ravekirin û çavkaniyên din- derbarê jiyana doh de bibe xwedî agahî. Bi gotineke din wêne dîrokê dîtbar dike. Gelek caran rûdanên dîrokî ku li ser kaxezan *cemidîne* bi rêya wêneyan ji wê *sarbûna* xwe dûr dikevin û bireng û ruh dibin. Kesên li *wir* bi rêya wêneyan careke din wek ku hîna li *vir* in û li hemberî me ne li me dinêrîn, tiştêkî ji me re dibêjin, bi me re dipeyivin. Loma ji bo hafîzeyaya takekesî û avakirina hafîzeyaya civakî an jî kolektîf wêne amûreke gelekî girîng e. Herçiqasî ev îcad di serdema *modern* de derketibe meydanê jî bi modernîzmê re di nav nakokiyekê de ye.

Derbarê mijarê, di pirtûka xwe ya bi navê *Modernite Nasî Unutturur* de Paul Connerton dibêje ku modernîzmêlezgîniyek derxistiye meydanê û di nav vê lezgîniyêde jî hafîze têk diçe, tê jibîrkirin. Di vê çarçoveyê de Connerton îcada rêya hesin wek sembola lezgîniya modernîzmê dinirxîne lê ligel vê lezgîni û pêvajoya têkbirina hafîzeyê tiştêkî din jî di wê demê de derketiye ku hevsengiyek bi vê lezgîniyê re çêkiriye ku ev jî îcada kamera û wênekêşiyê ye. Li gorî Connerton ev hevsengiyekê çandî ye û ligel ku rêya hesin lêzgîniyê hildiberîne, wênekêşî bêhereketiyê hildiberîne; ligel ku rêya hesin pêvajoyên bibîranînê dihejîne, li hev dixê, wênekêşî tebeqeyekê din li pêvajoyên bibîranînê zêde dike. Di vê nirxandinê de wêne şahidên dîrokê ne û ji ber vê yekê jî wêne û wênekêşî li hember jibîrkeriya modernîzmê wek berxwedanekê ye.

Di vê çarçoveyê de xebatên wênekêşiyê yê ku wek *wênekêşiya dokumenterî* tên binavkirin ji bo avakirina hafîzeyaya kolektîf û bibîranîna paşerojê gelekî girîng in. Xebatên wênekêşaaamerîkî Susan Meiselas jî dikarin di vê çarçoveyê de bîn nirxandin. Susan Meiselas endama *Magnumê* ye ku ajansêke navdar a cîhanî ya wênekêşiyê ye (Magnum Photo Agency) û wek endama vê ajansê xebatên balkêş ên wênekêşiya dokûmenterî kirine. Gelek salan li Amerîkaya Latîn xebitiye. Nîkaragua, Şîlî, El Salvador, sînorê Meksîka û Amerîka hinek cih in ku Meiselas li wir xebatên wênekêşiyê kirine. Xebateke wê ya navdar û balkêş jî derbarê kurdan e û bi navê *Kurdistan In the Shadow of History* hatiye çapkirin. Ev xebat ji bo kurdan xebateke “efsanewî” ye. Efsanewî ye ji ber ku em dizanin heye lê bidestxistina wê gelekî zehmet e. Wek gelek kurdan min jî ev pirtûka Meiselas gelekî meraq dikir û min dixwest ku vê pirtûkê bikirim, lê binêrim. Di 2013an de gava Susan Meiselas di çarçoveya *Rojên Wêneyan* de hat Diyarbekirê û li wir behsa jiyana xwe ya wênekêşiyê û xebata xwe ya bi navê *Kurdistan* kir û wêneyên ji xebata xwe pêşkêş kirin wekî hemû guhdarvanên li wir meraqa min jî hîn zêdetir bû û min xwest di demeke kurt de vê pirtûkê bi dest bixim. Lê çawa? Pirtûk li Amerîkayê bû û beha bû. Ligel vê divê kesek hebûya ku ji wir bi xwe re bîne. Ev derfet ancax piştî çend salan ket destê min gava yekî amerîkî bû xwendekarê me yê beşa Kurdî. Camer xwestekame nekir du û ji me re ji wir anî. Gava ku pirtûk nû ket destê min wek zarokêkî ku berî eydê cilê nû jê re hatibin kirin kêfa min hat. Min pirtûk danî ser maseya xwe ji bo herkes bibîne û yê ku didîtin jî gelekî dicibandin û kêfxweşiya xwe dianîn ziman. Min

dît ku pirtûk cara pêşî di 1997an de hatiye çapkirin û ya ku di destê min de bû jî çapa duyem ya 2008an bû. Ya ku em li ser diaxivin û danasîna wê dikin jî ev çapa duyem e ku di 2008an de hatiye kirin.

Pirtûk bi 4 wêneyên ji Herêma Kurdistanê dest pê dike ku yê pêşî dîmeneke ji çiyayên Herêma Kurdistanêye (Northertn Iraq) û yê duyem koça kurdên Iraqê ya 1991ê ye; di yê sêyem de em Qeladiza xerabe dibînin ku di 1989an de di operasyona Enfalê de hatiye ruxandin; di yê çarem de jî goristana qurbanîyên êrîşa kimyewî ya 1988an heye. Yanî bi her çar wêneyên di serî de em serborî û trajediya kurdan ya vê serdema nêzik dibînin.

Têkiliya Susan Meiselas bi kurdan û serboriya kurdan re jî jixwe di 1991ê de dest pê dike gava kurd bi tevahî ketin rojeva dinyayê de. Di pirtûkê de, vê destpêka naskirin û lihevraştatîna xwe ya bi kurdan re weha dibêje;

Gava Şerê Kendavê dest pê kir, wekî gelek amerîkiyan min jî derheqê kurdan de kêm tişt dizanîbû. Ziyareta min ya pêşî kurd bû. Ez kêfxweş bûm ku rojnamevanên rojavayî şahidiya pêdiviya demildest ya alîkariya insanî ya kurdan dikirin. Îranê vîzeyê pênc rojan û destûra ziyareta kampên pênerên kurd da min. Ji bo derketina ji Parîsê, derbasbûna sînorê Îranê û çûyîna herêma "rizgarkirî"ya di nav Bakûrê Iraqê de hindik wext hebû. Dema ku bala dinayayê li ser koçkirina kurdan bû, tiştêkî ez ber bi cihên ku ew jê dihatin ve dikişandim. Ez ber bi rêya ku kurd hîna jî jê dihatin ve çûm. Ez bi dîtina rewşê matmayî bûm. Ez tu carî bi wî awayî nebûbûm şahidê xerabkirina jiyana gundewarî ligel deh salên di nav şerên navxweyî yê Amerîkaya Navendî de jî.

Meiselas bi vî awayî kurdan û trajediya wan nas dike û heta 1997an jî dem bi dem diçe Herêmê û li wir wêneyan dikişîne. Ew di heman demê de di çarçoveya projeyeke mafên mirovan de derbarê Enfalê jî wêneyên cihên gorên girseyî dikişîne. Yanî bi wêneyên xwe dibe şahidê trajediya kurdan ya operasyona Enfala 1988an û wêneyên wê piştî bi salan jî dibin şahidê wê demê. Bi demê re Meiselas dikeve pey şopa wêneyên kevin ku li "Kurdistan"ê hatine kişandin, lê li derve ne ku di encamê de vê pirtûka di destê me de pêk tînin.

Pirtûka Susan Meiselas ji bilî *destpêk* û *wergeran*, ji şeş beşên sereke pêk tê. Hemû beş bi pêşkêşiyêke Martin Van Bruinessen dest pê dikin. Dîsa hemû beş ligel wêneyan hatine pêşkêşkirin ku ew wêne di wê demê de hatine kişandin û di arşîv û muzeyan de hatine parastin. Loma mirov di pirtûkê de, ne tenê dîroka kurdan ya 150 salî dixwîne lê vê dîrokê dibîne jî. Ji ber ku mijar di nav dîrokê de kurd in an jî wek sernavê pirtûkê "kurdên di bin siya dîrokê" de ne, ligel ku xebat ya Meiselas e wêneyên ku di xebatê de cih digirin hemû ne yên Susan Meiselas bixwe ne. Heta dikare bê gotin ku di pirtûkê de wêneyên herî kêm yên Meiselas in. Ev yek di tevahîya pirtûkê de tê dîtin.

Eger em bînin ser beşên pirtûkê; di *destpêkê* de Meiselas wê serboriya xwe ya naskirina kurdan, ketina pey şopa wêneyan û herweha zehmetiyên derbarê bidestxistina wêneyan vedibêje. Di salên 1992an de jineke biyanî di nav Tirkiyeyê re derbasî "Iraq"ê dibe û li wêneyan digere. Ew ne tenê li wêneyan digere, lê li kesên di wêneyên arşîvên Rojavayiyande jî digere li gel alîkar û rêberên xwe. Di 1993an de êdî hew dikare biçe Herêmê lewra Tirkiye

derî digire û çûnûhatina kesên ne girêdayî sazîyan bisînor dike. Êdî jê û pê ve Meiselas di arşîvan de li wêne û belgeyên derbarê kurdan digere.

Beşa yekem *Berî Şerê Mezin (Before The Great War)* e ku agahiyên derbarê kurdan ên berî Şerê Cihanê yê Yekem dide ûberê xwe dide nivîs, xebat û wêneyên lêkolîner, wênekêş, mîsyoner û gerokan ku Ernest Chantre, Antoin Sevruguîn, Emma Barnum, Isabelle L. Bird, Mark Sykes û Gertrude Bell tenê hinek ji wan in. Hem nivîsên wan û hem jî wêneyên ku kişandine di vê beşê de cih digirin.

Beşa duyem *Ji Împeratoriyan ber bi Netew-dewletan ve (From Empires to Nation-States)* ye. Di vê beşê de êdî bêhtir nêrîn, nivîs û wêneyên peywirdarên leşkerî yên dewletên Rojavayî hene. Dinya di nav guherînekê de ye û kurd jî dixwazin di nav vê guherînekê de cihê xwe bigirin. Serheng (Colonel) Noel, James G. Harbord, E. W. C. Noel hinek ji van peywirdaran e ku Meiselas cih daye nivîs, nêrîn û herweha wêneyên wan. Di vê beşê de serboriya kurdên Iraq û Tirkiyeyê bi wêneyan û ligel nivîsan hatiye pêşkêşkirin.

Di beşa sêyem de ku bi navê *Komara Kurd a Mehabadê (The Kurdish Republic of Mahabad)* e, serboriya Komara Mehabad nîşanî me dike ku di 1946an de li Mehabadê hatibû avakirin û di dawîya heman salê de hatibû ruxandin. Di vê beşê de dîsa wêneyên demê, nêrînen peywirdarên biyanî û her weha hevpeyvîneke Qazî Muhammed jî cih digire û beş bi wêneyên daliqandina Qazî Muhammed diqede.

Sernavê beşa çarem *Bihevrejîyana Nerehet (Uneasy Coexistence)* e ku serboriya kurdan ya piştî Şerê Cihanê yê Duyem heta dawîya salên 1990î pêşkêşî me dike. Tevgera kurdan ya Piştî Şerê Cihanê, rêwîtiya Mela Mustafa Barzanî ber bi Yekitiya Sowyetê, çalakiyên li Tirkiyeyê di vê beşê de ligel wêneyan cih digirin.

Beşa pêncem bala xwe dide salên 1960î ku kurd careke din ji bo bidestxistina mafê xwe dikevin nav tevgerê de. Loma sernavê beşê jî *Şerê Çekdarî ji bo Xweseriyê (Armed Struggle for Autonomy)* ye. Vegera Mele Mustafa Barzanî ji Yekitiya Sowyetê, çalakiyên çekdarî, jiyana gundewarî ya Kurdistana Iraqê ligel wêneyan cih digire di vê beşê de. Herweha rûdanên siyasî, civakî yên li Tirkiyeyê û Îranê jî di vê beşê de ne. Şoreşa Îslamî ya Îranê, darbeya leşkerî ya Tirkiyeyê ya 12ê Îlona 1980yî û bandora wan li ser kurdan ligel wêneyan hatine pêşkêşkirin.

Mijarên beşa şeşem êdî rûdanên piştî salên 1990î ne ku serdema *Piştî Şerê Sar (After the Cold War)* e. Şerê Sar (Cold War) qediyaye, Şerê Kendavê dest pê kiriye û kurdên Iraqê piştî tevgera bi salan derfeta aramiyê bi dest xistine. Beş bi wêneyekî dest pê dike ku naveroka beşê simbolîze dike. Ev wêneyê wêneyekî Sedam Huseyin e ku li ser dîwar e û piştî *şoreşê* bi guleyan hatiye xerakirin. Ji vî alî ve rizgarbûna kurdên Iraqê ji bin desthilatdariya Sedam Huseyin jî nîşan dike.

Herweha cih dide rûdanên berî 1990î jî yên wek Helebçe û Enfalê. Wek ku di serî de jî hatibû gotin di vê demê de kurd dikevin rojeva dinyayê û di kovarên navdar yên wekî Time de kurd dibin mijar. Herweha Meiselas di vê beşê de gelek nêrîn û wêneyên wênekêş û rojnamegerên biyanî ligel ên xwe pêşkêşî me dike. Ji aliyê din ve rûdanên li Tirkiyeyê, belavbûna pêvçûna çekdarî jî di nav mijarên vê beşê de ne. Wek ku di serî de hat gotin pirtûk cara pêşî di 1997an de tê çapkirin. Loma heta çapa duyem ya 2008an gelek guherîn çêbûne li

herê mê. Ji ber vê, di vê çapê de rûdanên piştî 1997an jî wek binbeşeke piçûk bi navê Not, Piştî Deh Salan (Postscript, Ten Years Later) cih digirin. Girtina Abdullah Öcalan û çalakiyên girseyî yên kurdên Tirkiyeyê; serkeftina partiya HADEPê di hîlbijartinên herê mî de; jî aliyê din ve midaxleya Amerîka li Iraqê û ezilkirina Sedam Huseyin û avabûna Herêma Kurdistanê jî wek mijarên vê dawiyê ne ku Meiselas di vê çapê de cih daye wan.

Pirtûk bi biyografiyên kesên navdar û yên ku di pirtûkê de cih digirin, ferhengeke kurt, çavkanî, pêşniyara çavkaniyên bo xwendinê û indeksê diqede. Wergerên tirkî û soranî yên nivîsên di pirtûkê de jî di dawiya pirtûkê de cih digirin.

Bi vî awayî xebata Susan Meiselas jiyan, tevger û serboriya kurdan a sedsalî bi wêneyan û ligel nivîsên ji çavkaniyên yekem pêşkêşî me dike û nîşanî me dide. Loma herçiqasî pirtûk jî aliyê wênekêşekê ve hatibe amadekirin jî û wêne di pirtûkê de cihekî sereke bigirin jî, xebat ne tenê ji wêneyan pêk tê. Wekî li jor jî hat gotin her beşek bi pêşkêşiyê Kurdologê Hollandî Martîn Van Bruinessen dest pê dike. Herweha nivîsên wê demê û bi taybetî jî wêneyên wê demê aliyê herî xurt ê xebatê ye. Ew wêne ne ku wek dokûmentekê li hember jêbirinê disekinin.

Wêneyên herî kevin ku di pirtûkê de cih digirin digihîjin salên 1890î ku bi giranî jî arşîvên gerok û mîsyoneran hatine wergirtin. Di heman demê de em rastî hinek xebatên zanistî jî dibin ku Meiselas cih daye wan. Xebata antropologê frensî Ernest Chantre ya bi navê *Les Kurdes* yek ji van xebatan e ku ligel wêneyên wênekêşê frensî Captain Barry di 1897an de hatiye çapkirin. Ev yek jî qedrê vê xebatê zêdetir dike.

Ji aliyê din ve xuyaye ku Meiselas ji bo vê xebatê di arşîvan de lêkolîn û lêgerîneke gelekî berfireh kiriye. Ne tenê wêne û wêneyên xwe peşkeş kirine, lê di heman demê de ji nivîsên lêkolîner, mîsyoner, peywirdarên leşkerî û gerokan; jî nivîsên rojnameyan û herweha ji wêneyên wênekêşan jî sûd wergirtiye û cih daye wan. Loma ev herçiqasî xebateke wênekêşekê be û wek xebateke wênekêşiyê be jî, di heman demê de dikare bê gotin ku xebateke etnografyayê ye; xebateke derbarê hafizeya kolektîf ya kurdan e jî. Wek ku Meiselas dibêje; *ev pirtûk, li ser bermayiyên ku ji nû ve hatine bidestxistin, jinûveavakirinek e.*

Di destpêkê de Meiselas derbarê pirtûkê de hevîya xwe weha îfade dike; *Ji bo kurdan, ez hêvî dikim ku ev pirtûk wek pirtûkeke çavkanî ya dîroka binpêkirî ku niha ji nû ve dikare bê bidestxistin, xizmetê bike.* Ez bawerim ev pirtûk di vî warî de xizmeteke bi vî rengî dide û dê bide kurdan û herweha wan kesan ku derbarê dîrok, jiyan û çanda kurdan lêkolînan dikin. Ji ber vê yekê jî wek ku me di serî de got; ev pirtûk divê di pirtûkxaneyê her kurdologekî de cih bigire.

Ji bo agahiyên din derbarê Susan Meiselas û xebatên wê dikare ji malpera wê sûd bê wergirtin (<http://www.susanmeiselas.com/>); jî bo projeya wê ya li ser kurdan û hinek wêneyên din ên derbarê kurdan jî (<http://www.susanmeiselas.com/archive/projects/kurdistan/#id=transformation>).